Biyavek

PÊDIVIYÊN ME BI NIVÎSERÊN SERBIXWE

Ebdilxaliq Siltan

Nivîser navek giran e, hemû kes neşên ji derheq derbikevin. Ne her kesê ku xameyek di destê xwe de girt û nivîsî, ew bû nivîser, ji ber ku nivîserê rast û durist ew e yê ku kartêkirinê li dorhêlê xwe bike û ev çende li cem hemû kesan nîne. Herwesa, ku biparêze, nexasime demê hindek hewlên da'ûrana wî ji layên siyasî û hukûmî dihên kirin.

Li vêrê, nivîserên kurd hene ku xwedan helwîst û mêjû, em neşên rolê wan di guhorîn û pêşvebirina jiyanê de ji bîr bikin.

Di salên borî de, prosa nîvîsînê li Kurdistanê bi awayek durist ne dihate encamdan, ji ber kawdanên siyasî û aborî û komelayetî yên ku Kurdistan û devera Îraqê tê de borîn. Lewra, ew zemîne bo nivîskaran nehatiye xweşkirin, ku bişên rolê xwe bi duristî bigêrin û kartêkirinê li ser dewrûberên xwe bikin, belê belkî rolê serekî yên kesên siyasî bûye û herdem nivîser jî neçar bûye ku bibe dûvelank bo siyasetmedaran ji ber ku kêşeya milletê me di destê kesên siyasetmedar de bû. Lê noke, piştî çespandina federaliyê di Îraqê de, divê nivîserê me jî hewl bide rolê xwe yê rast û durist û egerê xwe yê pêdivî bi cih bihîne. Ew jî avakirina civakek nû ye bi hemû awayên guhorînê û kar bike, ev jî guhorîne ya aktîf û berdewam be û hemû layenên civakî li ber çav werbigirin, hewl bide ku karê xwe cuda bike ji her layenekê din, bi şêweyek serbixwe ji bo hindek armancên pak û bilind ku ji astê mirovayiyê ne derkevin, bike.